em yekîtiya Partî vegerînin. Lê, sed mixabin, her layekî endamên xwe yên berê vegerandin kar, yên rûniştî bûn vegerandin rêxistina xwe, da her layek ji me re bide xuyakirin ku hejmara endamên wan ji ya layê din pirtir e…Me kir, ne kir, wan li hev ne kir û hewildanên me ji bo yekîtiya Partî têk çûn.

Di payiza sala 1972an de, kongireke din li ***Bamernê*** *hate damezirandin, komîta Navendî ji van rêzdaran dihate pê:*

Dihamê Mîro(Sekreter), Kenanê Egîd, Nezîrê Mustefa, Hemîdê Sîno, Ilyasê Remiko, Şêxmûsê Baqî, Mehmûdê Sebrî, Mustfayê Ibrahîm, Hûrîk, Zekeriya, Şêx Emîn Gulîn.

4- di 1-ê Tebaxa sala 1973-an de, ji ber hilwesta PARTÎ ya dij pilana Kembera Erebî, dezgehên ewlekariyê êrîş birin ser gundê Mozelanê ji bo girtina we, bi hovîtî gule berdane xelkê, mirovek hate birîndarkirin, ew bûyer çawa çê bû, kî hate girtin, kî li derve ma?.

Bersiv*: Di wê şevê de, civînek li gundê me* ***Mozelanê*** *pêk hat, tevî ku li ba me biryar hebû, gundên endamên komîta navendî tê de hebin, ji bo parastina wan û ya Partiyê, divê ti komcivîn di wan de çê nebin, ji ber ew gund di bin çavdêriya dezgehên asayişê de bûn. Herdu nobedarên min jî çûne wê civînê. Rezekî me nêzîkî gund hebû, ez çûme nav rêz, li wir, rûniştim, çavên min çûne ser hev û ez xilmaş bûm, rabû ez çûme malê, derî li xwe girt û razam. Asayişa dewletê bi ser gund de hatin, ji birayê min* ***Mihemed*** *xwestin ku mala min şanî wan bide. Ji birayê min we ye ku ez ne li malê me, ji ber wî birayara komîta navendî zanîbû divê endamên komîta navendî li malên xwe ranezin.Li derî xistin, min bi xwe derî ji wan re vekir, min dît ku asayiş e. Min hewil da ku ez xwe nedim dest wan, lê, derfet nema bû, ez û kurê minî piçûk* ***Kenan*** *girtin, bi hovîtî destên min kelemçe kirin û dest bi berdana guleyan kirin. Di encam de, mirovekî gundî bi navê* ***Emerê Hecî Mihemed*** *hate birîndarkirin. Wê şevê, em ji Dêrikê birin Qamişlo, min dît ku vaye hevalên min jî girtî ne, piştre, em rakirin Şamê.*

5- Piştî girtina Rêvebiriya Partî, çawa kar û barê rêxistinê birêve diçû?.

Bersiv*: Piştî girtina me, rêzdar Hemîdê Sîno û rêzdar Ilyasê Remiko kar û barê rêxistinê bi rêve dibirin.*

6- Çend salan hun di zindanê de man?

Bersiv*: Em ne bi hev re hatin berdan. Yê min bi xwe, ez 6 sal û 8 mehan di zindanê de mam. Dema şerê çekdarî di navbera rijêmê û rêxistina (Ixwan al muslimîn) de derkete holê, em berdan.*

7- Têkiliya we di zinadanê de bi hev re çawa bû, çi ji hundirê zindanê tê bîra we?.

Bersiv*: Bi rastî, li destpêkê, em ne li cem hev bûn, em di zindanên tekane de bûn, haya me ji hev tune bû, lê, di payiza sala 1973an de, piştî şerê bi Israyîlê re, gelek Cihû hatin zindankirin, rê di zindanên tekane de nema, rabû em kurd anîn cem hev.Têkiliyên me bi hev re biratî û dostane bûn. Piştî 3 salan di zindana parastina hudirîn de, em guhestin zindana* ***Al Qela****, ji nû ve, rê dane me ku di bin çavdêriya berpirsiyarê zindanê de em pêşwaziya xwedî û malbata xwe bikin, lê,* **D.R.(11)**